# Kengî, li ku û çawa – derbarê **hilbijartina 2026an de**

**Ev derbarê hilbijartina bê ya Parliman, Konseya Parêzgehê û Konseya Şaredariyê di sala 2026an de agahiyeke kurt e.**

Hemû agahiyên ku ji te re hewce ne li uppsala.se/val2026 tên dîtin



Uppsala kommun

Kurmancî



# Di sala 2026an de dema **hilbijartina** parliman, Konseya Parêzgehê û Konseya Şaredariyêye .

## Ji ber vê yekê divê tu deng bidî.

Tu li Swêdê û li Uppsalayê di girtina biryaran de beşdar dibî.

- Li hin deveran û di nav hin koman de, mirov ji yên din kêmtir deng didin. Lê hemû deng wekhev girîng in.
- Tu bandorê li ser tiştên ku ji te re girîng in dikî.

## Kî dikare deng bide?

Mafê te heye ku ji bo parlimanê  deng bidî heke tu:

- heta roja hilbijartinê 18 salî bî
- welatiyê Swêdê bî
- li Swêdê di qeyda nifûsê de qeydkirî bî, an jî berê qeydkirî bûbî.

**Parliman** wek mînak li ser qanûnên li Swêdê biryar dide. Dema tu ji bo parlimanê deng didî, tu kaxezeke zer a dengdanê  **hildibijêrî.**

Mafê te heye ku ji bo **Konseya Parêzgehê û Konseya Şaredariyê** deng bidî heke tu
18 salî bî û li şaredariyê an parêzgehê di qeyda nifûsê de qeydkirî bî.

Herwiha pêwîst e tu yek ji van mercên jêrîn pêk bînî:

- welatiyê Swêdê bî
- welatiyê yek ji welatên endamên Yekîtiya Ewropayê (YE), Îslend an Norwêjê bî
- welatiyê welatekî din bî ji xeynî yên ku hatine hejmartin, an jî bêwelat bî, û berî roja hilbijartinê sê salan li pey hev li Swêdê di qeyda nifûsê de qeydkirî bûbî.

**Konseya Parêzgehê** wek mînak biryarê dide li ser nexweşxane û veguhestina giştî, wekî otobusan. Dema tu ji bo Konseya Parêzgehê deng didî, tu kaxezeke **şîn a dengdanê** hildibijêrî.

**Konseya Şaredariyê** wek mînak biryarê dide li ser dibistan, pirtûkxane, lênihêrîna kal û pîran, park û û cihên avjeniyê. Dema ku tu ji bo Konseya Şaredariyê deng didî tu **kaxezeke sipî ya dengdanê** hildibijêrî.

## Bi vî awayî  tu dizanî ku tu dikarî deng bidî

- Karta te ya dengdanê ji qutiya te ya nameyan a dîjîtal re tê, an jî bi posteyê ji mala te re tê şandin Karta dengdanê nîşanî te dide ku tu di kîjan hilbijartinê de dikarî deng bidî û di roja hilbijartinê de divê tu li ku derê deng bidî




## Kengî divê tu deng bidî

- Roja hilbijartinê **roja Yekşemiyê 13ê Îlona 2026an** e. Wê demê tu dikarî li binkeya xwe ya dengdanê, ku li ser karta te ya dengdanê nivîsandî ye, deng bidî.
- Tu herwiha dikarî ji roja Çarşemiyê 26ê Tebaxê **ve pêşwext** deng bidî. Wê demê tu dikarî li her binkeyeke ji bo dengdana pêşwext deng bidî Dema ku hilbijartin nêzîk dibe, tu dikarî binkeyên dengdana pêşwext li ser adresa uppsala.se/val2026 bibînî .
- Dema tu deng didî, **nasnameyeke xwe** wekî pasaport an belgeya ajotinê bi xwe re bîne. Heke nasnameya te tune be, hevalek dikare nasnameya te piştrast bike


## Tu dikarî ji bo dengdanê alîkariyê werbigirî

- Heke tu ji ber nexweşî, astengdarî an temenê xwe nikaribî biçî binkeyekê, wê demê wergirên dengan dikarin werin mala te. Li **uppsala.se/val2026** agahiyên zêdetir hene.
- Karmendên navenda dengdanê ya ku hûn lê dengê xwe didin, dikarin bersiva pirsên we bidin û alîkariya we bikin. Karmendên wergirtina dengan yên ku li wan cihên tu lê deng didî kar dikin, dikarin bersiva pirsên te bidin û alîkariya te bikin


# Tu bi vî awayî dengê xwe didî

Heke pirsên te hebin an hewcedariya te bi alîkariyê hebe, ji kerema xwe bi karmendekî hilbijartinê re biaxive.


## 1 Zerfa dengdanê wergire




## 2 Pusûleya dengdanê bi tenê hilbijêre




## 3 Bi tenê here pişt perdeya dengdanê




## 4 Dengê xwe amade bike



## 5 Ji kerema xwe zerfên dengdanê û nasnameyê radest bike



## 6 Dengên te tên wergirtin



# Tu ji bo demokrasiyê pêwîst î !

Tu dikarî agahiyên zêdetir derbarê hilbijartinê de li van cihan bibînî, wekî mînak:

- www.val.se
- www.uppsala.se/val2026
- www.8sidor.se/partierna
  (agahiyên xwendina-hêsan derbarê partiyên parlimanê de)
- www.mittval.nu

Li vir agahî bi çend zimanên cuda hene